



# Xizmetên Pisorî û Gişt-alî

## GUHERTINA XIZMETAN JI BER BELAVBÛNA NEXWEŞIYA KOVÎD-19'ê

Raberkirina Xizmetên Pisorî û Gişt-alî (Specialised and Intensive Services) di serdema belavbûna KOVÎD-19'ê da hema wisa jibo seredaneran pêkan e. Tevî vê yekê, gengaz e ku şewaza raberkirina xizmetan li gorî şîretên fermî yên Tendurustiyê were guhertin.

Ji kerema xwe jibo gotûbêja derbarê van tevdirên nû bi awayê rasterast digel **Raberkira Xizmetên** xwe bikeve têkilliyê.

Derbarê **KOVÎD-19'ê û nîşaneyên wê agahyan bi dest bîne**

## Venihêrîna giştî

Bernameya Bichkirina Mirovdostane (HSP) xizmetên pisorî û giştalî (SIS) raberi daxwazkerên vîzaya mirovdostane û xwedî vîzayên din ên xwedan merc ku hewcetiyan lihevalyayî hene, dike.

SIS piştevaniya demkurt a li gorî hewcetiyan raberi seredaneran dike da ku di warê bidestxistina xizmetên nasyar û bidestxistina pisportî û hostetiyan pêwîst jibo rêveberiya serbixwebûna wan, alîkar be. SIS ji aliyê raberkirên Xizmetên HSP'ê û bi nûnertiya ji Wezaretê karên Navxweyî (Wezaret) va tê birêvebirin.

Lêzanînen têkillîgirtinê û cih û mekanên raberkirên xizmetên HSP li [vir li ber dest in](#).

## Xwedan-merc-bûn

Kesên ku yek ji vîzayên jêrê wergirtine, dikarin jibo wergirtina SIS xwedan-merc bin:

- Vîzaya penaxwaziyê (Bin- koma 200, 201, 203 and 204)
- Vîzaya Mirovdostane ya Cîhanî (Bin-Koma 202)
- Vîzaya Parastinê (Bin-Koma 866)
- Vîzaya parastina demkî (Bin-Koma 785), Mayîna Mirovdostane ya demkî (Bin-Koma 449), nîgeraniyên Mirovdostane ya demkî (Temporary Humanitarian Stay (Bin-Koma 786)) û Vîzaya Sitargeha Ewleh (Safe Haven Enterprise)(Bin-Koma 790).

Xwediyên van vîzayan rege heta pênc salan piştî derbasbûna nav Australyayê an heta pênc salan piştî dayîna Vîzaya Hundir-Sînorî ya xwe ya bawerpêkirî, xwedan-mercê wergirtina SIS bin.

Di rewşên awarte û istîsna da xwediyên vê vîzayê rege bibin xwedan mercê wergirtina SIS'ê di derveyî vê heyama demî da an rege xwediyên jêrkomên din ên vîzayê jî ji kesên xwedan merc bin. Welatiyên Australyayê xwedan-mercê wergirtina SIS'ê nînin.

Kesên ku xwedan-mercê SIS'ê ne, divê bêşiyani û nekarîna xwe di warê sûdwergirtina serbixwe ji piştevaniyên munasib, biselimînin û ketibin bin bandora berbendên cûrbecûr û dijwar, ji wan babetên li jêrê:

- Bê-Şiyani
- Hewcetiyan tendurustiyê yê giran, bingehîn, demdirêj û /anjê Kontrolnebûyî
- Mijarên têkildarî saxlemiya derûnî
- Bêmalbûn an nebûna maleke hertimî
- Tundiya navmalî an malbatî
- Nîgeraniyên têkildarî rihetiya zarok û nûciwanan
- Jihev-belavbûna malbatê an têkilliyê
- Tecrîda civakî
- Pirsgerêkên abûrî
- Mijarên mafdarî.

## Çi kesek dikare kesekî jibo wergirtina SIS'ê lêvegerîne?

Her rêxistin an kesek dikare kesekî jibo SIS'ê lêvegerîne. Ev yek yê lêvegerandî (referral) jî digire ber xwe.

## Şewaza lêvegera kesî jibo wergirtina SIS'ê

Jibo lêvegera kesî bo SIS'ê, ji kerema xwe bi awayê serxet (online) **forma Lêvegera bo SIS'ê** tîjî bike.

Heke tu piştrast nîmî ku kesek jibo wergirtina SIS'ê xwedan-merc e an na, an heke te jibo tijîkirina vê formê hewcetî bi alîkariyê heye, ji kerema xwe bi têkiliya bi hejmara 1300 855 669 di saetên karî ya AEST (Têkilî li Australyayê bêpere ye), digel hêla lêzanînan a SIS'ê bikeve pêwendiyê.

Heke tu dema tijîkirina forma Online da tûşî kêşeya teknîkî bûyî, dikarî di saetên karî da bi riya hejmara 1800 020 283 an bi riya şandina E-Mail'ê bo [hspsystem.helpdesk@dss.gov.au](mailto:hspsystem.helpdesk@dss.gov.au) digel maseya alîkariyê ya sîstema HSP'ê bikevî têkilliyê û alîkariyê werbigirî.

Heke tu nikarî forma Online bi dest bixî, dikarî **Versiyona wê ya Kaxezî** tîjî bikî.

## Piştî raberkirina forma lêvegerê, dê çi biqewime

Piştî ku Wezaret forma tijîkirî werbigire, dê hêjatiya kesê (kesên) lêvegerandî vekolîne û kesê ku ew şandine ji encama wî karî haydar bike. Heke wer diyarkirin ku ev kes (kesana) xwedan mercê SIS'ê ne, Wezaret raberkira xizmetên SIS'ê neçar dike ku SIS'ê bo wî kesî (wan kesan) raber bike.

Heyama demî ku kesê seredaner ji SIS'ê sûdê werdigire girêdayî bi hewcetiyan kesane ye, lê bi giştî heta şeş mehan e.